



Ūsiv





Published by the Comic Bible Society, LLC
Copyright © 2021

Kingstone Comics maintains copyright to
this comic book as provided by United
States copyright law.

Print and digital copies of this version may
be freely distributed without penalty under
a Creative Commons license.

Piştî ku Ûsiv, kurê Aqûb ji Rahêlê, li ber pêz bû çû ba bavê xwe û jê re li ser kirînen xerab ên birayên xwe got.



Ji ber ku Ûsiv di kalîtiya bavê xwe Aqûb de hatibû dinê, bavê wî jê re kincekî dirêj û bi xemil çêkir.

De ji xwe re li wî binêrin.
Ew heta kirasê xwe ya taybet jî diştine.



Îcar em bê guman
dizanim kî ji me bijartiyê
bavê me ye.

Bibore, diviya bû ku ew
bikarîba te bi wî kincî yê
geş bidîtîba.

Divê kurê bavê
xwe yê biçûk
xurt û dijwar be



Lê Xwedê hişt ku Ûsiv
xewnekê bibîne.



"Min xewnek dît ku me gurzan girê didan. Ji nişka ve gurza min rabû û çik sekinî, lê gurzên we xwe li ber gurza min tewandin."

Vêca çavê te lê ye tu li ser me bibî serwer?

Gelo tê bibî serwerê me?

Dema ku em dixebitin tu xewnan dibînî

Guhdarî bike, min xewneke din dît ku divê ez ji we re bêjim.

Ma nexwe ez, diya te û birayên te em ê bîn û xwe li ber te bitewînin erdê?

Me ji te re got bawo -- Ew tenê xewnan dibîne û qet naxebite.

"Vê carê, roj, heyv û yanzdeh stêrk li ber min ditewiyan."

Birayên wî jê dexisîn, lê xewna wî di hişê Aqûb de ma.

Despêk 37:6-11



Birayên te li Şexemê pezên me
diçêrînin. De here binêre ka
ew hemû bi silamet in.



Va ye, xweyê
xewnan tê.

Tawusê
pirrengî
bi xwe.

Va ye fersenda me, de werin em wî
bikujin û jê xilas bibin. Wê bavê
me tu tiştî nizanibe.



Na, em wî nakujin.
De werin em tenê wî
bavêjin vê bîra çolê.

Rûbên ev yek got ji
bo ku kur rizgar bike.




hey, wî paşde bikişîne
derve! Gelo em ê bi
kuştîna birayê xwe
çi qezenc bikin?

De werin em li şûna
vê yekê wî bifroşin
îsmailîyan!






Mîdyaniyan Ûsiv firot Potîfâr.
Ew Misriyekî dewlemend ku
fermandarê parêzvanan bû.



Gava ku Ûsiv jê re xebitî,
Potîfâr hê dewlemendtir bû.



Û gava wî Ûsiv kir serkarê hemû
mala xwe -- Potîfâr hê pîroz û
bi bereket bû.



Ummm...



Xorto, were, bi min re
razê. Ew ê bibe serpêhatiyek
ku tê qet ji bir neki.

Mêrê te her tiştê xwe daye
destê min -- Îcar ez çawa
dîkarim xerabiyêke wiha
li pêşîya Xwedê bikim?



Jina Potîfâr her roj li pê
Ûsiv geriya lê wî heta
nehîst ku ew nêzîkî
wê bibe.

Rojekê dema ku ji xizmetkarên malê tu kes li
hûndir tunebû wê fersenda xwe dît...

Niha -- em dikarin têra xwe
hez kirin vexwin! De were,
bi min re razê.



Hewar!
Hewar!




Ew zîlamê îbranî ku te anî vir kir ku min
rezil bike -- ew revî çû çaxê min kir
qirîn û hewar -- lê min karî kincê
wî wergirtiba.




Tenê derê ku jê re
heja ye -- wî biavêje
zîndana girtiyên padîşah.

Niha!



Lê heta di zîndanê de -- Xwedê bi Ûsiv re bû.




Ez ew sedema ku te anî vir qet bawer nakim.
Tu xema yên belengaz dixwî, tu dikî ku xwarin
bi dirîştî were birêkûpêkkirin û tu ji xwe re jî
tu tiştêkî zêde nahêlî.

Ez te li ser hemû tiştên li zîndanê
berpirsiyar dikim. Îcar tê ji min
re tenê tişt ragihînî.



Di her karê ku Ûsiv dikir de
Xudan ew bi ser dixist.



Firewn li herdu sermanpêj û sermeygerê xwe yên li zîndanê ji ber zimandirêj û fermanên wan hêrs e.



Tu çawa dikarî xwe ragirî ku tu di vê qulika pûç û xirab de bî?

Ez hîn bûm ku li ku derê bim razî bim. Ew tiştek e ku Xwedayê min fêrî min kiriye.



Kîjan Xwedê? Kîjan dibe bila bibe, wî bê guman hemû kesên li vir dijîn ji bîr kiriye.



Çima îro mirûzê we tiş e?

Me herduyan xewn dît, lê kesê ku şîrove bike tune.

Ma şîrovekirin ne karê Xwedê ye? Kerem bikin, de xewnên xwe ji min re bêjin.





Min mîwek bi sê gûşiyên tirî dîtîn.
Min tirî guvaşt hûndirê tasa Firewn
û tas da destê wî.



Sê gulî sê roj in -- Wê di sê rojan
de Firewn serê te bilind bike û te
bine ser karê te yê berê.

Ji kerema xwe tu min bîne bîra xwe û giliyê min
ji Firewn re bike, çimkî ez bi zorê ji welatê Ibraniyan
hatim vir û li vê zîndanê bi neheqî hatim şûdarkirin.



Di xewna min de sê
selik nan li ser serê
min hebûn.

Di selika herî jorîn de, her
cûreyê pasteiyên pehtî hebûn, lê
teyran ji selikê li ser serê min
dixwarin.



Sê selik jî
sê roj in.

Wê di nav sê rojan de Firewn serê te
rake û te bi darê ve daleqîne û wê
hemû teyr goştê te bixwin.



Şîroveyên Ûsiv hatin cih -- Lê çaxê sermayger vegeyriya
ser karê xwe, wî Ûsiv neanî bîra xwe û ew jî bîr kir.

Piştî du salan.




De herin hemû sêrbaz
û aqilmendan li pêşiya
min bînin -- Niha!



Min şeva çûyî du xewn
dîtin -- wan herduyan ji
min re şrove bikin.



Di xewna xwe de min dît ku heft çêlekên
saxlem û qelew di nava qamişên çem de diçêrin...



... Lê dûv re heft çêlekên qor û bêmirêz ji
Nîlê derketin û heft çêlekên saxlem xwarin.

Piştî ez hişiyar
bûm.






Min xewneke
din dît.

Min dît di tayekî
genim de heft
simbilên dagirtî û
baş derdiketin...



... Piştî wan, heft simbilên din ên qels û ji bayê
rojhilat kizirandî zîl dan û wan heft simbilên
dagirtî û baş daqurtandin.



Firewnê mezin, tu kes ji
me nikare xewna wê şîrove
bike.


Ew ji me re
nehatine
êşkerekirin.

Lê xewn rast bû --

Pêdivî ye ku
kesek bikaibe
wê şîrove bike
an na wê îlahan
wê nedidan
min!

Îro sûcên min
tên bîra min!

Dema ku ez hatim zîndankirin bi me re xortekî
îbranî hebû ku xewna min û ya sermanpêj şîrove
kirin -- û her duyan jî ji dîl pêkhatin.



Îcar wî ji min
re bînin!



Ez nikarim lê Xwedê dikare bersiva xêrê bide Firewn.

Xewnên Firewn yek in û eynî Xwedê nîşanî te da ka ew ê çî bike.

Eynî mîna heft simbilên genim, heft çêlekên baş heft salên baş in û heft çêlekên qor heft salên xelayê ne ku dê li pê bîn.



Ji ber vê xelayê, wê li Misirê hemû tîr û tîjebûn werin ji bîr kirin û wê welat jî wêran bibe.

Mirovekî fêmdar û şehreza bibîne û wî bîne ser tevahiya welatê Misrê.

Karmendan li welêt peywardar bike ku di nav heft salên bê de ji dextlê pêncan yekî ber bistinin û bicivnin.



Di nav heft salên bê de ev
xwarin bibe qût da ku millet
bikaribe ji ber xelayê neşikê.



Ma em dikarin kesekî wek vî
mirovî bibînin -- ku ruhê
Xwedê pê re ye?



Madem Xwedê kir ku tu bi van
hemû tiştan bizanî, -- yekî ji te
fêmdartir û şehrezatir tune.



Divê ji te re Safnat-Panêah were gotin û
wê hemû gelê Misrê emrên te bine çî.



Ez ê tenê bi textê xwe
ji te mezintir bim.

Bi wî awayî ez te datînim
ser seranserê welatê Misrê.

Rê
vekin!



Di heft salên firehiyê de Ûsiv genim dan
ber hev û di embaran de lod kirin.



Her wiha Firewn jineke Misrî jî ji Ûsiv re anî.

Ûsiv navê kurên xwe Minaşşe ("dide jîbîrkirin")
û Efrayîm ("du qat berdar") danin.

Xwedê ez li welatê
ku min lê tengasî
kişand berdar kirim.



Mirovên parêzgehên me ji nêza
dimirin -- hela li herêmên derveyî
sînorên me jî xwarin tune.

Embarên genim ên
welêt di bin destê Ûsiv
de ne -- Ew çî jî we
re bêje, bikin.



Dawiya
dawiye -- genim!

Va ye niha malbata min
dikare bîjt û birçî nemîne.

Ji her malbatekê
re tenê du selik.

Ûsiv genim firot Misriyan -- û herwiha gelên derdorê jî
ji ber ku xela li tevahiya herêmê giran bû.







Hûn ji ku derê tîn?

Em ji welatê Kenanê hatin ku xwarinê bikin.

Hûn casûs in! Hûn hatine bizanibin ka ku derê welatê me bêparastin e.

Na ezbenî! Em mirovên rast in û ne casûs in.

Û xewnên Ûsiv hatin bîra wî.



Na -- Hûn hatine ku li welatê me bigerin.

Na, em diwanzdeh bira bûn. Em hemû kurên zilamekî ne.

Yek êdî ne sax e û biçûkê me jî bi bavê me re ye.



Hûn casûs in û hûn ê bi vî awayî werin ceribandin.

Heta birayê we yê biçûk neyê vê derê, hûn ê ji Misrê demekevin. Ji nav xwe yekî bişînin û yên mayî jî wê bikevin zîndanê.



Hele wan bavêjin zîndanê!



Piştî sê rojan...

Hûn li gorî gotina min bikin, hûn sax biminin, çimkî ez ji Xwedê ditirsim.

Heger hûn ji dil mirovên rastî in, bila yek ji we li vir bimine û yê din jî herin û bi xwe re genim bibin.

Lê -- divê hûn birayê xwe yê herî biçûk jî min re binin û bi wî awayî wê gotina we rast derkeve.



Bi rastî em ji ber birayê xwe tîn cezakirin.

Gava ku wî ji bo jiyana xwe ji me re lava dikir, me dît ku çî ezîyetê dikişîne.

Ev tengasî ji ber vê yekê hat serê me.

Ma min ji we re ne got ku li dijî kurik gunehkariyê nekin? -- Lê we guhdarî nekir!

Va ye niha, em hemû li hesabê xwîna wî didin.



Birayên Ûsiv nizanibû ku ew ji wan fêr dike, çimkî yekî ji wan re dida wergerandin -- Îcar Ûsiv ji ber gotinên wan pir xemgîn bû.





Safnat-Panêah emir dide ku tûrikên ev zilaman bi qasî ku hewce ye bi genim werin dagirtin.



Pîşraşt bin ku zivê her yekî paşde bixin tûrikên genim ên wan û ji bo rê gelek zewade bidin wan.

Bila bi ya te be, ezbenî.



Zû --
werin vir!



De binêrin, zivê min li tûrikê min vegerandine.

Ev çi ye ku Xwedê bi me dike?



Serwerê wî welatî bi hêrs
bi me re peyivî -- Wî got
ku em casûs in.

Wî got em dikarin vegerin lê Şimûn
li ba xwe hişt û got ku divê em Binyamîn
ji bi xwe re bibin da ku ew baş
bizanibe ku em ne casûs in.



Wey, zîvê min jî
di tûrikê min de ye.

Yê min jî!



We min ji kurên min vegetandin -- Ûsiv
tune, Şimûn tune û niha hûn dixwazin
Binyamîn jî bibin!?

Her tişt li
dijî min e!



Gava ez Binyamîn ji te
re neyînim, herdu kurên
min bikuje.

Tu wî bispêre
min, ez ê wî ji
te re bînim.



Kurê min bi
we re nayê.

Heger di rê de tiştek were serê wî, hûn
ê serê min ê spî bi kul û kedar berjêrî
diyarê mirîyan bikin.

Destpêk 42:29-38

Piştî mehan.

Ezbenî, îro me nanê dawî pijand.
Hemû genimê ku kurên te ji
Misrê anîbûn êdî hat qedandin.

Divê hûn disa herin
û ji me re hinek xwarin
bikirin.

Em nikarin. Ji me re
hat gotin heta birayê me yê herî
biçûk bi me re neyê em ê
rûyê serwêr nikaribin bibînin.

We çima ji zîlam re got ku
birayekî we yê din heye û
ev xerabî anî serê min!?

Wî kûr kûr
pîrsa me kir.

Kurik bi me re bişîne û ez bi xwe
jê re dibim kefil. Heger tu tiştî were serê
wî, bila ez her û her sûcdar bim.

Îcar em dereng nemana,
niha em du caran çûbûn
û hatibûn.

Madem wiha ye, herin. Ji berên herî qenc ên welatê me
bixin barên xwe. -- Bi xwe re du qat zîv ji wî zîlamî re bibin.

Birayê xwe tavilê hildin û rabin -- Herçî
ez im, ji zarokên xwe biqetîm jî, ne xem e.




Wê Safnat-Panêah
we di nîvro de
bibîne.

Wî ji bo we
xwarinê amade kiriye.



Bê guman wî em aniye vir
da ku me bikuje ji ber dîzîna zivê wî.

An jî dibe ku Xwedê ev yeka
ji ber dev berdana me ji Ūsiv
tîne li pêşiya me...



Ezxulam, cara pêşî dema ku me
ji vir derket, me dît ku zivên me
ji nû ve di tûrikên me de ne.

Em şaş mane ka
çawa ew pêkhat. Ji
ber vê jî, me bi qasî
wî du qat anîn.



Netirsin. Xwedayê
we ew xezîneya
da we.

Va ye ji we
re birayê we.

Îcar berî xwarinê lingên
xwe bişon û em ê em
bidin kerên we.

Destpêk 43:15-25



Gelo bavê we yê kal ê
ku we behsa wî kiribû
çawa ye?

Bavê me,
xulamê te, dijî
û baş e.

Û ew e birayê we
yê biçûk?
Xwedê te
bihêle lawo!



Û siv nikarî xwe bigirtiba û jî odeyê derket...



... û di odeya xwe de girî.



Hele sifre deynin.



Li gorî adet, yê Misriyan bi İbraniyan re xwarin nedixwarin, çimkî ev yek kirêt bû.

Birayên Êsiv ecêb man çaxê ew li gorî temenên xwe li ser sifrê hatin rûniştin.



Hele binêrin -- para Binyamîn pênc caran ji para me zêdetir e!

Tûrikê her yekî bi qasî ku ew
bikarin hilgirin bi qût dagire -- û
zîv jî ji wan re vegeftine.

Tasa min a zîvîn
jî bixe tûrikê yê
herf biçûk.



Ez ji bo çûyîna
malê hazir û
amade me.

Ez im ku bi mehan
di zîndanê de ma bûm!



We çi
kiriye?

We tasa malxweyê min a ku
ew pê vedixwe û pê li falê
dinêre birîye.

Xwedê
neke!

Ma çima em ê wiha bikin - Me
heta zîvîn ku me di tûrikên
xwe de dîtin ji vegevandin.

Çi...






Tas bi kê re bê dîtin, bila
bê kuştin û yên mayî jî
bila bibin xulamên
xweyê min.

Hele di tûrikên
wan de bigere.



Kê be bila bibe, lê
ne yê herî biçûk.

Baş bigerin.



Xiss...
Xiss...



We ji malxweyê me
Safnat-Panêah dizî. Divê
hûn vegein ku li pêşiya
wî bisekinin.

Camêrî bi hîle
hat kirin.

Ev yeka nabe... Wê bavê
me nikanibe xwe ragire.



Ev çi ye ku we kiriye? -- Ma we nizanibû ku ez dikarim tiştan bi falê kişî bikim?

Ezhenî, ka em çi bibêjin? -- Em çawa dikarîn xwe bêsûc derxîn?!



Çimkî tu yekî wek Firewn î -- Ji kerema xwe guhdarî min bike.
Tu pirsibû ka bavê me an birayên me hene.



Me wisa bersiv da û got: "Bavê me yê kal û kurekî wî yê ku di kalîtiya wî de jê re çêbûye heyel."

"Birayê wî mir û ew kurê diya xwe yê yekta ye. Bavê wî pir jê hez dike."

Tê ji me re got ku heta ku birayê me bi me re neyê, em nikarin vegerin welatê xwe.

Dema ku xwarin li ba me hat qedandin, bavê min ji me re got...



Jina min ji min re du kur anîn. Yek ji ba min dûr ket û ew bê guman hatiye perçekirin -- Heta niha min ew nedîtîye.

Heger zirar bigihîje vî kurî, wê porê min ê spî bi kul û keder berjerî diyarê minyan biçe.



Xulamê te ji kurik re bû kefil.

Bîla ez li vir bimînim û ji te re bibim xulam û kurik vegere ba bavê xwe -- Ez nikarin vê xerabiye li bavê xwe bikim û bi çavê serê xwe bibînim.



Her kes -- ji ba
min derkevin!



Yiaaahh!!



E---ez i-im
birayê we Ûsiv...

... Ew e yê ku we
ew firot koletiyê.



Nabe...

Çç-iii...



Li ber xwe nekevin
û bila li zora we neçe.

Ne ku we ez şandim
vir -- lê Xwedê.



Ev du sal e ku li welêt xela
heye û wê hê pênc salên
din bidome.

Xwedê ez li pêşiya we şandim ku
li ser rûyê erdê ziriya we biparêze
û jiyana we bi serfirazi rizgar bike.



Divê hûn bilez bizivirin
ba bavê me û vê yekê jê
re bêjin...

Xwedê ez kirim xweyê
tevahiya Misrê.



Dereng nemnin,
vegerin ba min û ez ê
we li welatê Goşenê
bi cih bikim.

Divê hûn niha bilezînin herin
û ji bavê me re bêjin -- An na
hûn ê perîşan bibin.



Û Ûsiv çû û bi ser birayên xwe de giriya.



Pşt

Ez kēfxweş im.

Hele herin, gazî
Safnat-Panêah bikin.



Xeberêke ecêb
gihîştîye guhên
min.

Padişahê min, ew xeber bi tevahî rast
e -- Çiroka ku ez şawa gihîştim vir ku
xizmela Firewn -- û amancên Xwedayê
bav û kalên xwe bikim di cih de ye.



Bavê xwe û malbatên
birayên xwe bîne vir.

Ji bo jin û zarokên wan erebeyan
bibin -- Wê axa herî baş a welatê
Mîsrê ya we be.




Nanê rê li van deh keran bar
bikin, tev kincên nû ji her yekî
ji we re.

Û ji kurê biçûk re -- pênc
deşt kinc -- û sê sed Şekel
zîv.



Û di rê de şerê
hev nekin!



Divê em li vir li Bîr-Şevayê rawestîn.

Ez ê li vir wekî bavê xwe
Îshaq Xwedê biperizim.



Aqûb! Aqûb!

Belê ezbenî!



Ji çûna Misrê
netirse -- çimkî ez
li wê derê ziriya te
bikim miletekî mezin.

Ez ê bi te re
werim Misrê
û dîsa te
vegerînim vir.

Çaxê tu binirî, wê
Ûsiv li ber serê te be.

Destpêk 46:1-27

Aqûb bi kurên xwe û
malbatên wan re ji
Bîr-Şevayê derketin -- Ew
bi tevahî heftê kes bûn.

Û berê xwe dan
mala xwe ya nû
ya demkî -- li Misrê.





De herin ba Ûsiv -- û ji wî
rêya Goşenê bizanibin.




Bavê min.



Ez çiqas li hêviya
dîtina rûyê te bibûm.



Û Ûsiv demke dirêj giriya.



Ez ê we bibim ba
Firewn lê jê re bibêjin
ku hûn şivan in.

Wê hingê hûn ê bikaribin li
Goşenê bişin -- çimkî şivantî
û xweyên pêz li ba Misriyan
kirêt in.



Û karê birayên
rêvebirê min ê
sereke çi ye?

Em şivan in.

Wê hingê hûn ê li welatê
Goşenê dûr bimînin.



Û tu çend salî yî --
bavê Safnat-Panêah?

Salên min ên
xerîbiyê 130 ne.

Salên min hindik Û zor hatin derbaskirin, lê bi
qasî salên bav Û kalên min ên xerîbiyê dom nekirin.



Hingê Aqûb Firewn,
padîşahê Misrê, pîroz kir.

Paşê Aqûb jî dîwana wî derket.

Va ye bavê min --
Ev dera herî baş
a welêt e.

Ez ê ji te û her malbatekê
re li gorî hewceya we
xwarinê peyda bikim.



Wek ku xela bi awayekî giran hat li ser wan, Ûsiv hemû perê ku li Misrê û Kenanê hebû, bi firotina genim civand.

Wê hingê yên Misrî dîsa hatin ba wî.



Em hewceyê genim in -- Xwarin bide me. Te ji xwe hemû perê me bir. Ma em li ber çavê te bimirin?

Ez ê di ber pezê we de xwarinê bifroşim we.



Pîştî salekê...

Niha hemû pere û heywanên me di bin destê te de ne.

Niha -- Me û zeviyeñ me di ber xwarinê de bikire.

Va ye ji we re tov ji bo axê. Ji niha pê ve, ji dextlê 1/5 bidin Firewn û 4/5 ji ji xwe re hilînin.

Te canê me rizgar kir.



Lê li Goşenê malbatên Aqûb berdar û pir zêde bûn.



Dema mirina min nêzik dibe.

Soz bide min ku tê min li vir, li Misrê, veneşêrî. Bila ez serê xwe li cem bav û kalên xwe deynim.

Ez ê wekî gotina te bikim, bavo.



Bavê te nexweş
e -- Dibe ku nêzikê
mirinê be.

De zû, kurên min
hildin û ew ê bi min
re biçin ba wî.



Va ye kurê te
û siv li vir e.

Îcar wî ji
min re bînin!



Xwedayê Karîndar li
Lûzê, li welatê Kenanê
li min xuya bû.

Wî soz da ku wê min berdar
bibe û wî welatî yê baş
bibe her û her milkê me.



Ev kê ne?

Ev kurên min in. Xwedê
ew li vir dan min.

Wan bîne ba
min ku ez wan
pîroz bikim.



Min qet guman nekir ku ez ê rûyê te
dîsa bibînim -- lê va ye Xwedê min
hişt ez zarokên te ji bibînim.



Va ye ji te re bavo, hem min
û hem ji zarokên min pîroz
bike.



Bila Xwedê ku bavkalên min
Îbrahîm û Îshaq li ser rêya wî
çûn... Bila ew van kuran pîroz
bike.

Bila ew bi navê min bîn gazîkirin
û li ser rûyê erdê pir zêde bibin.



Na bavo! Destê xwe
yê rastê deyne ser
serê yê pêşî.


Kurê min, ez
dizanim.

Ew ê ji bibe
miletê mezî.



Lê belê wê birayê wî jê mezintir
bibe û wê ji ziriyeta wî komeke
miletan rabin.

Wê Îsraîl wan pîroz
bike -- "Xwedê te
wek Efrayîm û
Minaşşe bike."



Ez pareke ji para birayên te
zêdetir didim te -- Min ew ji Amoriyan
bi şûr û kevanê xwe stand.

Rûbên, tu bi hêz î! Lê
êdî tu nabî yê herî hêja,
çimkî tu çûyî nav
nivîna bavê xwe.

Şimûn û Lêwî çekên zordariyê
bikar tînin, bila nalet bê li hêrsa
wan. Ew ê li Îsraîlê belav bibin.

Cihûda, wê destê te di
stûyê dijaminê te de be
û serwerî jî te neçe.

Wê Zebûlon rûne li
rûberê deryayê û bibe
wargeh jî bo gemiyan.

Îssexar kerekî zexm e û wê
piştî xwe jî bo suxrê bitewîne.

Û Dan jî, wê edaletê jî
gelê xwe re peyda bike.

Gad, wê rastî êrişa
birek siwaran bê, lê wê
bide ser piştî wan.

Wê xwarina Aşer dewlemend
be – Xwarinên padîşahan li
ba wî çêbin.

Neftelî xezaleke
azad e ku karikên
xweşik tîne.

Û siv şaxekî berdar e ku li ser
dîwarekî dikeve. Kevanê wî bi
destê Xwedayê Aqûb ê Hêzdar
zexim ma.

Binyamîn gurekî har
e ku nêçîra xwe dixwe.

Min di şikefta ku bapirê min Îbrahîm
jî Efronê Hîttî kiribû de û ku bav û
diya min lê hatine veşartin veşêrin.

Û min
Lêayê jî li
wir veşart.



Bavo! Ax,
bavo!



Gelê me heftê roj
şîna bavê te kirin.

Gelek spas ji bo
vê rêzgirtina mezin.

De here, ez destûrê didim
te ku tu sond bi cih bînî.

Bavê min ez dame sondê ku
ez wî li welatê Kenanê li
cem bavkalên wî veşêrim.



Bavê me got ku em vê yekê jî te re
bêjin: --'Ji kerema xwe nehegiya birayên xwe
û gunehê wan li dijî te bibexşîne.'

Destpêk 50:1-21



Em niha
xulamên te ne.

Ma ez di cihê
Xwedê de me?

We xerabiyê niyet kir lê
Xwedê ev niyet vegerand
ser qenciye.

Netirsin. Ez ê hem
we û hemî jî zarokên
we xweyî bikim.



Ûsiv 110-sal emir kir û neviyên neviyê xwe dîtîn.

Û wî van gotinan ji birayên xwe yên sax re got:

Ez li ber mirinê me, lê bê guman wê Xwedê bê alikariya we û we bibe wî welatê ku ji Îbrahîm re soza wê dabû.

Û gava ew ev yeka bike... divê hûn hestiyên min ji vê derê derxin.



Ûsiv hat mûmyakirin û li Misrê hat veşartin.



"THE BIBLE EXPLAINED
IN EVERY LANGUAGE."



SUPERBIBLE.TV